Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1116 | 12-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Agirê sînemeya Amûdê wê her di bîra dîroka mirovahiyê de zindî bimîne


**Beriya 63 salî, li sînemaya Amûdê, derî li ser zarokên Kurd hat girtin û bi agirê di hundir sînemê de, zêdeyî 283 zarokan jiyana xwe ji dest da.Tevî ewqas sal di ser bûyerê re derbas bûne jî, heta niha aliyên li dû bûyerê nehatine cezakirin.**

"Roja 13e Mijdara 1960an ji bo gelê Amûdê û Rojava, rojeke dilsoj e. Ew roj li Amûdê agirek bi Sînemaya Şehrazad ket û di encamê de qetlîameke mezin rû da. Ew şev agirek bi salona Sînemaya Şehrazad a li Amûdê ket û trajediyeke mezin a ku îro jî di hişûbîrê gel de cih girtiye, derkete meydanê.

"Rayedarên rejîmê wê demê zarokên Amûdê bi mecbûrî birin salonê da ku wê fîlmê temaşe bikin. Kapasîteya salona sînemayê ji bo nêzikî 200 kesan bû, lê 500 zarok kom kirin û tê de bi cih kirin. Piştî ku agir bi salonê ket, leşkerên rejîmê deriyê sînemayê girtin û nehiştin gel agir vemirîne û zarokan ji şewatê xelas bike. Vê yekê rê li ber karesateke mirovî vekir û trajediyeke mezin rû da.

"Di Agirê Sînemaya Amûdê de ji 283 zêdetir zarokên Kurd ku temenê wan ji 12 salan biçûktir bû, şewitîn û jiyana xwe ji dest dan.

"Di ser Qetlîama Agirê Sînemaya Amûdê re 60 sal derbas bûn lê îro jî bi awayekî cidî û karîger ev bûyera dilsoj û tarî nehat ronîkirin, lêpirsîneke heqane derbarê berpirs û rayedar û saziyên de nehat vekirin, tu kesî di mêzîna edaletê de hesabê vê karesat û azara giran neda. Bi ser de, Hikûmeta Sûriyeyê bi salan nehişt gelê Amûdê vê trajediya mezin bi bîr bîne. Rejîmê her tim bi zext û zor û qedexeyan xwest ku ev qetlîam bê jibîrkirin.



**'Nîşana polîtîkayên dijminatiyê bû'**

"Agirê Sînemaya Amûdê, nîşana gelek xemsarî û polîtîkayên dijminatiyê ya rejîma BAASê bû ku li dijî zarokên Kurd hat pêkanîn. Zihniyeta ku hemû mafên bingehîn ên zarokên Kurdan desteser kiribû, ew bênasname hiştibû û ji cih û warên wan koçber kiribû, xwe di wê Agirê Sînemaya Amûdê de aşkera kir û rûpeleke reş û tarî li dîroka mirovahiyê de zêde kir.

"Gelê Rojava û xelkê Amûdê îro hem ji bo ku Agirên Sînemaya Amûdê dubare nebin û hem jî ji bo ku cîhadî û hevkar û piştevanên wan careke din agirê Amûdê li zarokên Kurdan gur nekin, li ber xwe dide, têkoşîna xwe ya hebûn û rûmetê didomîne; jiyanê diparêze.

"Di 60emîn salvegera Komkujiya Sînemaya Amûdê de, em hemû zarokên ku di wî agirî de hatin qetilkirin bi rêzdarî, bi rehmet û bi xemgînî bi bîr tînin. Em wê qetlîamê ji bîr nakin û nadin jibîrkirin. Agirê Sînemaya Amûdê 60 sal in venemiriye û îro jî dilê me disojîne."

**Çi bi bû?**

Di şeva 13'ê Çiriya Paşîn de agir bi Sînemaya Amûdê ketibû û di encamê de 280 zarok can dabûn. Sînema ku têra 200 zarokî dikir 500 zarek hewandibûn. Wexta 500 zarok di sînemayê de agir dest pê kir, deriyê salona sînemayê girtî bû. Mihemedê Seîd Axayê Deqorî di vê bûyerê de xelaskerê gelek zarokan bûye. Di şeva Şewata Sînemaya Amûdê de, ji sînemaya ku dişewite bi dehan zarokan derdixe û rizgar dike. Di dawiyê de stûnek di ser de hat xwarê û canê xwe ji dest daye.

# Alavên ji rêzê bi porselenê mayînde dike



Malzemeyeke weke porselenê, bêhtir rê û wêneya kevin tîne bîra mirovan. Çawa ku ew ji serdemeke kevnar mabin. Lê, Brock DeBoer bi porselenê malzemeyên nûjen dinirxîne. Forim û malzemeyên ku bi kar tîne dijberî hev du bin jî ew berhemên xweşik diafirîne û vê jî bi malzemeyeke weke porselenê dike.

Ew serê pêşîn, di sala 2008'an de dest bi çêkirina peykerên ji porselenê dike û bi piratîkeke baş di karê xwe de bi ser dikeve. Brock DeBoer dibêje, "Ez ji porselenê hînî gelek tiştan bûm û cerbiandin min ên baş çêbûn di vî warî de. Porselen malzemeyekî pir xweşik e lê ewqasî jî hesas û zor e. Lê ji ber vê yekê, min jî xwest pê re mijûl bibim. Ji lewma malzemeyekî bi vî rengî nahêlê hûn xwe sist bikin û divê hûn her tim baldar û şiyar bin."

Di warê estetîk de jî ew du tiştên dûrî hev nêzî hev du dike. Malzemeyên nûjen yên ji rêzê û porselenên zarîf bi hev du re şirove dike. Hêla porselanan ya ku weke arşîveke darîçav dimîne, bala wî kişandiye. Brock DeBoer di salên 90'î de li Dakoteya Başûr mezin bûye û alavên ku bi porselenan çêdike jî nîşaneya wan salan in. Ew ji bo vê yekê jî dibêje, "Ji bo min ev alava yan jî malzeme girîng in, mixabin hin ji van malzemeyan li ber xwe nedan û zû hatin jibîrkirin. Weke nimûne solên werzîşê zû kevin dibin. Min bi rêya van berhemên porselenî ew hest careke din bi bîr anî û her wiha bi vî awayî xwest ev hest mayînde bibin. Bi rêya malzemeyê porselenî min ev yek bire serî û hestên xwe jî bi van berheman anîn ziman."

Sudoku: Bersiv 27

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 6 | 3 | 2 | 8 | 7 | 5 | 4 | 1 |
| 8 | 5 | 4 | 3 | 6 | 1 | 2 | 7 | 9 |
| 7 | 1 | 2 | 4 | 9 | 5 | 6 | 8 | 3 |
| 4 | 7 | 9 | 8 | 5 | 6 | 1 | 3 | 2 |
| 5 | 2 | 1 | 7 | 4 | 3 | 8 | 9 | 6 |
| 3 | 8 | 6 | 9 | 1 | 2 | 4 | 5 | 7 |
| 6 | 4 | 8 | 1 | 7 | 9 | 3 | 2 | 5 |
| 2 | 9 | 5 | 6 | 3 | 4 | 7 | 1 | 8 |
| 1 | 3 | 7 | 5 | 2 | 8 | 9 | 6 | 4 |

Sudoku:Pirs 28

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 3 | 4 | 5 | | 9 | | |
| | | | 1 | | 9 | | | 4 |
| | 6 | 9 | | 8 | | | 5 | |
| | | | | | 3 | 1 | 2 | 8 |
| | | | | | | | | |
| 5 | 2 | 8 | 7 | | | | | |
| | 3 | | | 7 | | 4 | 8 | |
| 9 | | | 2 | | 4 | | | |
| | | 2 | | | 1 | 6 | 5 | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Dest û lingên wî li hev ketin:**
- Bi heman wateyê.
**Dest û lingên wî li hev alan:**
- Bi heman wateyê.
**Destê mêran ne şehîn e:**
- Çi biqewime ne diyar e; dibe ku tiştin mezin biqewimin; ji destê mêran çi derkeve ne diyar e.
**Guhê şeytên kerr be:**
- Ji van deran dûr be; înşeleh tiştên wisa li van deran çênebin.
**Nayê dest:**
- Xwe dide aliyekî; dûr disekine; nêzîkî me nabe; sil e.
**Pisîka şîrrijandî ye:**
- Bi sûcê xwe zane.
**Serê wî li darê mezelê ket:**
- Pir tirsiya; ket xetereke mezin; hindik ma ku bimire.
**Xwe nade dest:**
- Xwe dide aliyekî; dûr disekine; nêzîkî me nabe; sil e.
LI SER ZIKREŞIYÊ
**Awirên wî çiya tînin xwarê:**
- Çavteng e; çavînok e; bi çavên xwe xirabiyên mezin dike.
**Bibe baran erdê şil nake:**
- Derfetên wî hebin jî qenciyê nake; zikreş e.
**Bibe baran li ti kesî nabare:**
- Bi heman wateyê.
**Bi zikreşîyê pengiviye:**
- Ji kînê tijî bûye.
**Çavkund e:**
- Çavxirab e; çavpîs e; çavînokî ye; çavker e.
**Çavên wî yek û dudu ne:**
- Bi heman wateyê.
**Çavan jê girtiye:**
- Çavînî bûye; çav lê dane.
**Çav dayiyê:**
- Çavnebariyan dike; zikreşiyan dike; dixwaze ji xwe re bistîne; dixwaze tiştna bike.
**Çavê wî lê ye:**
- Dilê wî jê re naxwaze; zikreşiyan dike; dixwaze ji xwe re bistîne; dixwaze tiştna pê bike.
**Çavê wî tê de ye:**
- Bi heman wateyê.
**Çavnebar e:**
- Naxwaze; zikreşiyan dike; xêrnexwaz e.
**Çavê wî bare nagire:**
- Bi heman wateyê.
**Çavên wî bar nabin:**
- Bi heman wateyê.
**Çêlîkên mar di zikê wî de ne:**
- Pir bikîn e; zikreş e.
**Dinya bikeve zikê wî wê xwe biavêje avê:**
- Ji ti kesî hes nake; zikreş e; ji ti kesî re naxwaze; xêrnexwaz e.
**Di çavê wî re diçe:**
- Çavê wî bare nagire; naxweze; zikreşiyê dike.
**Di bin çavan re li min nêrî:**
- Bi zikreşî li min nêrî.
**Ew çi dûpişk e:**
- Zikreş e; xasok e; xêrnexwaz e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Jin di şoreşên cîhanî de



**Jin bi qasî koletî û zordariya ku li ser hatî meşandin, ew qasî bi ked û tekoşîna xwe cih û navê xwe di tevahiya dîrokên cîhanî de bi tîpên zêrîn nivîsand. Derbarê vê yekê de jî Rêber Abdullah Ocelan wiha dibêje: Navê Sîstemê ji mêj ve şensê xwe yê sererastbûnê bi reforman ji dest daye. Ya pêdivî pê heye 'şoreşeke jinê ye' ya ku wê li tevahiya qadên civakî were meşandin.R-2**

# Pêngava Azadiyê di nava mehekê de li 6 parzemînan û 31 welatî belav bû



**Pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî" di nav mehekê de li 6 parzemînan de 31 welatî û 105 navendan belav bû, bi hezaran kesayetên navdar beşdar bûn.R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1116 | 12-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# PLANÊN QIRKIRINÊ BI DAWÎ NEBÛNE Û BERXWEDAN JÎ BERDEWAM E

Bi saya berxwedana cangoriyên azadiyê yên ku ji kaniya felsefeya azad ya Rêber Apo av vexwarine, beriya 8 salan Şengal ji destê çeteyên herî xeter di cîhanê de rizgar bû. Hevseroka Rêveberiya Xweser A Demokratîk A Şengalê Cîhan Cîlo diyar kir ku tevî berdewamiya hemû hewldanên qirkirinê jî, civaka Êzidî li ber xwe dide û pergala xwe ya Xweseriya Demokratîk xurtir dike.**R-6**



# Ciwanên Efrînê: Dîwarên Îmraliyê wê bi hêza ciwanan bê şikandin



Endamên Tevgera Ciwanên Şoreşger ya Herêma Efrînê piştgiriya xwe ji pêngava cîhanê ya azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan ragehandin û gotin, wê bi rihê ciwanên serdemê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo misoger bibe.**R-5**

# 'Radiyoya Orkêş dengê jiyanê ye'



Radiyoya Orkêş ku di 1`ê Îlona 2014`an de li bajarê Amûdê dest bi weşana xwe kir, di nava civaka kurd, ereb û Suryan de pir hatiye hezkirin û bûye dengê rast ê pêkhateyên Amûdê. Rêveberê Radiyoya Orkêş Sebah Yasîn diyar kir ku Radiyoya Orkêş dengê civakê temsîl dike û got, Orkêş dengê jiyanê û hêza civakê ye.**R-7**

# Gelo Tirkiye dixwaze bi vê rêyê biçe ku derê?

**Di destpêka Îlona vê salê de kevneşopiyeke hêzên cîhanî hate bicihanîn: Civîna 20 Dewletên pêşketî. Wekî tê zanîn ev, her sal tê lidarxistin. Hêzên serdest ên cîhanê, li hev kom dibin nîqaş dikin ku wê keda gelan çawa dagir bikin, kîjan welatan xira bikin (jixwe di mejî û hişmendiya wan de 'avakirin' tine) û kêmasiyên wan çi bûne ku nekarîne hê zêdetir civaka cîhanî tengav bikin.R-4**






**Li Rojhilata Navîn Hevrikiya hişmendiyan?**
Idrîs Henan *R-5*

# Jin di şoreşên cîhanî de

Jin bi qasî koletî û zordariya ku li ser hatî meşandin, ew qasî bi ked û tekoşîna xwe cih û navê xwe di tevahiya dîrokên cîhanî de bi tîpên zêrîn nivîsand. Derbarê vê yekê de jî Rêber Abdullah Ocelan wiha dibêje: Navê Sîstemê ji mêj ve şensê xwe yê sererastbûnê bi reforman ji dest daye. Ya pêdivî pê heye 'şoreşeke jinê ye' ya ku wê li tevahiya qadên civakî were meşandin.



**Deriya Çiya/ Qamişlo**

Çawa ku koletiya jinê koletiya herî kûr e, divê şoreşa jinê jî bibe şoreşa herî kûr a wekhevî û azadiyê. Şoreşa jinê divê hem di teorî û hem jî di çalakiyê de gavên bi kok biavêje.

Di bin sernavê " jin jiyan e". Jin ji dema zayîna xwe ve reng û rûyê jiyanê xemiland. Her çiqasî ku desthilatdariya mêrê serdest li ser hatiye meşandin jî, lê tu carî nehatiya şikestin bi yek desî li hember zilma tevahî dewletan liberxwedane û jiyan guhertine. Ev jî çend nimûne ji şoreşên jinan yên ku li cîhanê deng vedane.

Şoreşa Ektober ya jinên Rosî

Di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de, jin bi girseyî ketin kargehên Rûsî dewsa zilamên ku derketin eniyên şer girtin, heya ku ew %43 ji hêza kar pêk anîn. Rewşa wan bi teslîmbûna serê malbatê, şîdeta nav malê, barê ol û kevneşopiyê, nexwendewarî, mûçeyê mêran ji nîvê kêmtir, û mecbûriyeta jina ducanî ku heta zayînê bide xebitandin û roja din ji nû ve dest bi kar bike, maye.

Şoreşa Rûsyayê di sibata 1917'an de li Petrogradê bi xwepêşandaneke jinên karker dest pê kir. Di meha cotmehê de, di bin serokatiya Partiya Bolşevîk de, li ser bingehê seferberî û rêxistinbûna karkerên jin û mêr bi xwe bû sedema desthilatdariyeke nû. Di heman demê de Meclîsa Komîseriyên Gel jî yekemîn hikûmeta cîhanê bû ku jinek bi navê Alexandra Kollontai tê de beşdar bû.

Desthilatdariya nû di warê guhertinên qanûnî de zû bi dest xist, tiştê ku femînîstan li welatên bi navê demokratîk ên Ewropa û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê têdikoşin, ango mafê dengdanê û namzediyê, bi dawî anîna desthilatdariya serokê malbat, zewaca medenî, hêsankirina hevberdanê, û mafên wekhev ji bo zarokên ku di zewacê de çêbûne. Qedexekirina jinên ku bi şev dixebitin, mûçeya wekhev, betlaneya dayikbûnê 16 hefte ji bo karkerên jin.

Weke ku Lenîn di dawiya sala 1918'an de gotiye: "Li tu derê cîhanê wekhevî û azadiya jinên kedkar bi vî rengî pêkve jiyana bi temamî nehatiye dîtin. Di dîrokê de cara yekem hiqûqa me hemû tiştên ku jin bê maf kirin ji holê rakirin. Dûvre axaftina xwe wiha domand: "Helbet qanûn têrê nakin. "Ji ber ku di navbera wekheviya li ser kaxezê û wekheviya rastîn di jiyana rojane de nîne.

Ji bo ku li dijî vê mîrateyê şer bikin, di payîza 1918'an de, rêberên Bolşevîk Alexandra Kollontai, Innessa Armand û Concordia Samoilova zêdetirî 1,100 jin li Kongreya Jin û Karkerên Gundî ya Hemî Rûsyayê kom kirin. Di sala 1919'an de, tevî dijberiya hin çalakvanan, wan di Komîteya Navendî ya Partiya Bolşevîk de dabeşek bi têkoşîna di nav karkerên jin de ava kirin, ku heya sala 1930'î berdewam kir: Delegeyên jin ji hêla karkerên jin û gundiyan ve ji bo demekê hatin hilbijartin. Karkerên jin ji bo guhdarîkirina pirsgirêkên wan li hev kom dibûn, beşdarî civînan bûn, li dijî alkolîzmê, li dijî şîdeta nav malê, li dijî nexweşiyan û hwd., kampanyayên propagandayê û hînî rêvebirina saziyên kolektîf bûn. Hêza Sovyetê bi destkeftiyên xwe yên qanûnî û madî, îradeya guherînê ya ku ji mîlyonan jinên kedkar û gundî û gelek hevalên wan derdiket nîşan da û kevneşopiyên ku bi sedsalan giranî li ser jiyana jinan girtibûn hejand.

**Xanima Şoreşa Reş**

Di êvareke Kanûnê ya sar a sala 1955'an de, Rosa Parks-a bi çermê tarî amûrên xwe yên dirûtinê berhev kirin û piştî rojeke dijwar a xebatê xwe amade kir ku vegere mala xwe. Di rê de, Parks li benda otobusê rawesta. Wê demê qanûnên Amerîkî bi tundî rûniştina mêrê reş qedexe kir. Dema ku axayê wî yê spî rawesta bû, û di wê demê de gelemperî bû ku li deriyê yek ji dikan û xwaringehan tabelayek daliqandî bibînin ku li ser nivîsîbû: "Kûçik, pisîk û mêrên reş qedexe ne. derbas bibin."

Rosa li otobusê siwar bû û li ser yek ji kursiyên xwe rûnişt, lê dema ku rawestgeha din hat, çend rêwî siwar bûn û zilamek spî çû cihê ku ew rûniştîbû, li bendê bû ku ew dev ji kursiyê xwe berde, lê wê ev nekir û bi awireke xemsar razî bû. Li ser vê yekê mêrik hêrs bû û dest bi nifiran li wê û hemû rêwiyên otobusê kir, lê wê bersiva wan neda. Hay ji xwe hebin, şofêrê otobusê neçar ma ku biçe cem polîs. Derbarê vê kiryara neqanûnî de, lêkolîn li ser Rosa hat kirin û ji ber binpêkirina mafên kesên din 15 dolar ceza hat birîn û ji vir û şûnde çirûska şoreşa reş li Amerîkayê bi destê Rosa dest pê kir, ku biryar dan hemû rêyên hatinûçûnê kontrol bikin û daxwaza mafên xwe yên wekheviyê kirin. Ji bo heyama 381 rojan, bi milyonan zû tevlî vê serhildanê bûn heta ku dadgeha Amerîkî di sala 1956'an de rakirina veqetandina nijadî li ser otobusan pejirand.

**Jîna Emînî û rejîma Îranê**

Kuştina jina ciwan a Kurd Mahsa Emînî, piştî ku ji aliyê "polîsên exlaqî" li Îranê hat binçavkirin, bû sedema nerazîbûn û kampanyayên medyayî yên gel li dijî qanûna hîcaba bi darê zorê û rejîma Îranê bi giştî.

Ew keça ku ji ber xuyabûna têlên porê wê jiyana xwe ji dest da, bû semboleke nû, ji bo parastina azadiya jinên Îranî û cîhanê eşkerekirina şert û mercên nemirovî yên ku di civaka ku hîn di tarîtiya serdema navîn de dijî û dibîne, canê xwe feda kir. Duruşma "Jin, Jiyan, Azadî" li kolanên Îranê bi tundî li dijî pêkanîna yasaya "hicaba mecbûrî" û li dijî qanûnên piştî şoreşa Îranê di sala 1979'an de hatin derxistin, deng veda. "Tîrmeha borî bi rêya medyaya civakî. Wan piştrast kir ku ew ê bê hicab derkevin kolanan. Ev şoreş jî li tevahiya dunyayê belav bû û bû sedema hişarkirina bi hezarên jinan ji bo daxwaza azadiyê.

**Şoreşa 19'ê Tîrmehê**

Şoreşa 19'ê Tîrmehê li Rojavayê Kurdistanê dîroka berxwedana jinan careke din zindî kir, û rastiya wê ya dîrokî ya ku bi hezarên salan nehatibû tomarkirin û her dem her kes hewl dida ku nasnameya wê ji holê rake, vegerand. Yek ji nasnameyên ku Rojavayê Kurdistanê Pê navdar bû jî berxwedana jinê ye. Bi şoreşê re jin dîsa vegeriyan jiyanê û rol û şarezayiya xwe nas kirin. Ji ber ku jin niha di hemû qadan de xwedî rola sereke ye û di hemû qadan de jî xwedî desthilata biryardayînê ye.

Şervanên Yekîneyên Parastina Jin di berxwedana li dijî çeteyên DAIŞ'ê de hêzeke çalak bûn û cîhan bi berxwedana şervanên jin matmayî ma, ji ber wê jî gelek pirtûk û belgefîlm li ser berxwedan û têkoşîna şervanên jin hatin çêkirin. Di nava Sîstema Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jin ji sedî 50'ê erkên îdarî de cih digirin û hevserokatiya sîstema rêveberiyê dikin. Bi dehan rêxistin û meclîsên taybet ên jinan hatine avakirin. Ji ber ku ev rêxistin û destê ji bo hişyarkirin û pêşxistina jinan dixebitin, diafirînin û avakirina civakê ji nûve dikin.

Di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de jinan di sala 2013'an de ji bo parastina xwe û welatê xwe ji êrîşan, Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ava kirin û hêzên YPJ'ê jî bi berxwedana xwe ya di şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê de li cîhanê deng veda.

Cîhan bi berxwedana jina Kurd matmayî ma û maskeya kêmhişmendiya ku di civakê de bi cih bûbû û jin bêhêz dihesiband, ket xwarê. Ji ber vê yekê şervanan îradeya azad a jinê temsîl kirin û hêza jinên Kurd kirin mînak û li tevahiya cîhanê bû pêşeng û mînak. Îro jî di sîstema rêveberiya xweseriya demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de rol û şarezayiya jinan cihekî girîng û sereke digire û çawa ku mohra xwe li şoreşê da, niha jî bûye sembola jinên cîhanê.

Berovajî, hêzên serdest û dagirker ku naxwazin kêliyekê jî vê rastiya girîng û dîrokî ya rola jinê bibînin û bi hedefgirtina pêşengên jin dixwazin vê pergalê tine bikin. Lê berovajî daxwazên wan, hêza jinê di şoreşa Rojava de roj bi roj berfireh bû û bandora xwe li tevahiya jinên cîhanê kir û bû sembol.

# Li navenda çandiniyê êdî çandinî nayê kirin

Li navçeya Erdîşê ku navenda çandiniyê, ji ber polîtîkayên şaş cotkar êdî nikarin dabara xwe bikin. Cotkar Mûstafa Yilmaz diyar kir ku ji ber krîza aborî di berhemên xwe de zirar dikin. Li Wan û navçeyên wê ku navenda çandinî û sewalkariyê ne, her curê berhemên çandiniyê tên çandin. Gelek cotkar li navçeya Erdîşê ku ji aliyê ax û çavkaniyên avê ve gelek dewlemend e, bi çandiniyê dabara xwe dikin. Erdîş ku ji aliyê erdîngariya xwe ve li gorî navçe û bajarên herêmê xwedî cihekî baştir e, avhewaya wê hênkayî ye. Ji ber cihê xwe yê erdnîgarî û axa xwe ya berhemdar, bi sedan berhemên cuda tên çandin. Deşta ku Erdîş tê de ye, ji zeviyên pir fireh û rast pêk tê. Ji ber ku gelek robar di deştê re derbas dibin, heta îro pirsgirêka avdanê çênebûye. Li gel ku xwedî axên bi bereket e jî ji ber polîtîkayên şaş ên çandiniyê û bajarvaniya ne rêkûpêk, piraniya berhemên ku li deşta Erdîşê tên çandin, êdî nayên çandin û gelek berhem jî kêm tên çandin.

Li deşta Erdîşê darên tirî, kartol, genim, behîv, kelem û her cure sewze û her wiha darên sêv, hirmî, qeysî, gûz û tû hebûn. Erdîşa ku wekî embara çandiniyê ya herêmê tê zanîn, îro qadên xwe yên çandiniyê kêm kiriye û hema bêje tune ye. Li deşta Erdîşê ku berê her cure berhemên çandiniyê lê dihatin çandin, îro li şûna zeviyan mal û zeviyên vala hene. Beriya 10 salan hemû pêdiviyên fêkî û sewzeyan a herêmê li Erdîşê dihat temînkirin. Lê îro pir ne mimkûn e ku mirov qala van berheman bike. Li Erdîşê gelek berhemên ku berê dihatin çandin, êdî nayên çandin. Li Erdîşê ku zeviyên çandiniyê zêde nemane, cotkaran bi çandina berhemên çandiniyê hewl didin dabara xwe bikin. Cotkaran ji ber krîza aborî di berhemên xwe de zirer dikin.



**'Em nikarin lêçûnên xwe pêşwazî bikin'**

Mûstafa Yilmaz ku li Erdîşê cotkariyê dike, diyar kir ku par gelek berhemên çandiniyê bi dest dixistin, lê îsal berhemên çandiniyê kêm bûne. Yilmaz got ku ji ber krîza aborî lêçûn pir zêde bûne û anî ziman ku ji ber buhabûna sotemeniyê nikarin berhemên xwe bibin cihek din û bifiroşin. Yilmaz anî ziman ku li gel ku di navbera Erdîş û Çalderanê de 60 kîlometre heye, dema ku bi wesayitê berheman dibin neçar dimînin ji 2 hezar TL zêdetir pereyê sotemeniyê bidin û wiha got: "Zêdebûna buhaya sotemeniyê cotkaran bêzar dike. Ji bo çandina zeviyê xwe min 3 hezar şitil, her yek ji 3 TL'yan kirîn. Min tenê ji bo şitilan 9 hezar TL da. Ew qas lê çûn, lê tiştek bi destê me nakeve, em nikarin lêçûnên xwe jî pêşwazî bikin. Ez îro dev ji karê çandiniyê berdim û di karê înşaetê de bixebitim ez ê zêdetir pere qezenc bikim. Em 5 kesin di vê zeviyê de dixebitin, lê tiştek bi destê me nakeve."

Yilmaz got ku beriya cotkariyê ajokarê kamyonê bûye û wiha got: "Min kamyona xwe firot û dest bi çandiniyê kir. Berhemên ku li vir bi dest dixin, dibim Ebex, Bêgir û Wanê û difiroşim. Em hewl didin berhemên xwe bi xwe bifiroşin. Ger berhemên xwe bi xwe nefiroşin, tiştek bi dest naxin. Cotkar tiştek bi dest naxin, bazirgan qezenç dikin."



# 'Radiyoya Orkêş dengê jiyanê ye'

Radiyoya Orkêş ku di 1`ê Îlona 2014`an de li bajarê Amûdê dest bi weşana xwe kir, di nava civaka kurd, ereb û Suryan de pir hatiye hezkirin û bûye dengê rast ê pêkhateyên Amûdê. Rêveberê Radiyoya Orkêş Sebah Yasîn diyar kir ku Radiyoya Orkêş dengê civakê temsîl dike û got, Orkêş dengê jiyanê û hêza civakê ye.

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

Radyoya Dengê Orkêş di 1'ê Tebaxa 2014'an de dest bi weşana testê kir û di 5'ê îlona 2014'an de bi awayekî fermî li Amûdê dest bi weşanê kir. Navê Dengê Orkêş ji Girê Orkêş ê dîrokî ango bi navê Girê Moza tê naskirin hatiye girtin. Li vê herêmê Beriya Zayînê bi hezarên salan şaristaniya Hûriyan ku li tevahiya herêmên Sûriyeyê belav bibû serwer bûn. Ji bo ku çanda resen a gelên Mezopotamya û şaristaniya Hûriyan careke din were nûjenkirin, ev nav lê hatiye kirin. Dengê Orkêş ji bo xwe xeta Şoreşa Rojava wekî bingeh armanc kir. Her dem bi serkeftinên şoreşê re bû yek û ji bo dengê Rojava yê rast bigihîne tevahiya civaka kurd, ereb û suryanî hemû hewldanên xwe dike.

Derbarê kar û xebatên Radiyoya



Dengê Orkêş rêveberiya radiyoyê Sebah Yasîn ji Rojnameya Ronahî re axivî.

**Kar û astengiyên Radiyoya Orkêş**

Sebah Yasîn diyarkir ku Karê radiyoyê parastina çand û dîrokê ye û wiha got: "Radiyoya Orkêş jî wek hemû beşê raghandinê li Rojava, di destpêka avakirinê de zehmetî kişandin, ji ber ku karê ragihandinê karekî çandî û fikriye, divê mirov herdem di nava lêgerînê de be, ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku karê ragihandinê zehmetire ji wan karê din, herwiha karê ragihandinê karekî nû bû di nav civaka Rojavayê Kurdistanê de, ji ber ku berî Şoreşa 19`Tîrmehê ev kar nebû, her kes bi tirs nêzîk dibû, li kêlek vê yekê me gelek zehmetî ji aliyê teknîkê ve dîtin, hin caran alav ji me re pêwîst bûn, lê demek dirêj dixwest heya ku digihan me. Herwiha ji ber êrîşên dewleta Tirk li ser amûrên me yên teknîkê me gelek zehmetî kişand, heta niha jî ev êrîş berdewamin."

**`Radiyoya Orkêş dengê jiyanê ye`**

Sebah derbarê xebatkarên radiyoyê wiha got: "Di dema niha de 14 endamên radiyoyê hene, 6 ji wan jin û 8 xortin. Bi giştî em dikarin bêjin 18 bernameyên me yên tên weşandin hene, bernameyên me yê ku rojane sibehê derdikevin, li



ser hemû beşên civakê ne, mîna bernameyên zarok, ciwan û jin jî hene, di heman demê de yê siyasî û analîzkirina rewşa siyasî, fikirî, bîrdozî û hunerî jî hene, herwiha eger pirsgirêkeke civakê hebe tên dighînin radiyoya me, guhdar û daxwaza çareseriya wê pirsgirêkê dikin. Dan û standina me jî bi guhdaran re qutnabe, rojana nûçegihanên me di nav bajar de digerin û têkiliyê bi civakê re dikin, eger daxwazek, rexnek û mijarake wan hebe bixwazin bighînin me, em ji wan re pêşkêş dikin, ji destpêka meha Îlonê ve me dest bi weşana xwe ya nû kiriye, bernameyên ku me di weşana kevin de pêşkêş dikirin di weşana nû de em radikin û nema pêşkêş dikin, herwiha di weşana me ya nû de ,bernameyên nû lê hatin zêdekirin, wek şevbuhêrka Orkêş, dengbêjî, çîrokên dengbêjan û bernameyên li ser bîrdozî jî zêdebûne, hêviya me ew e ku çawa Orkêş bûye dengê jiyanê, bibe hêza civakê jî."

# Ebdo Resûlo sazbend û parêzvanê çanda resen

**Zana Roj/ Şehba**

**Di şikefteke kevnar de xortê Efrînî Ebdo tembûrên ku saz, awaz û çanda welatê wî diparêze çêdike. Ebdo çêkerekî tembûra ye ku di şert û mercên zehmet de tembûran çêdike.**

Ebdo Resulo, ji gundê Keferdelê yê girêdayî navçeya Cindirêsê ye. Dema koçberî Şehbayê bûne dest bi xebatên çêkirina tembûran kir. Ebdo bavê Sê zaroka ye û li gundê Ziyaretê ya navçeya Şêrawa jiyan dike.

**'Ji darên hişk tembûran çêdike'**

Ebdo di destpêkê de anî ziman ku ji mereqa lêdana tembûrê ew fêrî çêkirina amûrê jî bû û wiha got: "Piştî ku em bi darê zorê ji Efrînê derketin. Em weke malbat li gundê Ziyaretê bi cih bûn. Kar û malên me hemû li pey me man û me dest bi jiyaneke nû li ser esasê vegera Efrînê saz kir. Lê belê şert û mercên jiyanê li vir gelek zehmet bûn. Ji bo xwedî kirina malbatê pêwîstî bi kar heye. Ez ji darên hişk tembûran çêdikim, ango ez ji amûra tembûrê pir hez dikim. Her wiha hezkirina ji saza temûrê ew meraqeke cuda ye. Rojek ji rojan min ji xwe re got "Çima ez tembûran çênakim?" Li ser vî bingehî min ev yek ji xwe re weke kar girt dest û hezkirina min roj bi roj mezin dibû".

**'Ji pêkanîna xeyalê zarokekî min destpêkir'**

Ebdo anî ziman ku yekemîn amûr da çêkirin ji zarokekî re bû û wiha domand: "Cara ewil min dest bi çêkirina tembûrê kir, ew jî li ser daxwaza zarokekî ku gelek meraqê wî li ser hebû min çêkir. Bi derfetên



kêm min textên kevin yên di malan de kom kirin û min tembûreke biçûk li gor temenê wî zarokî çêkir. Niha ew zarok bûye sazbendekî herî jêhatî. Bi vê gavê êdî îlhama min mezintir bû û wiha ev kar hat destpêkirin."

**'Ji tûnebûnê hebûn tê afirandin'**

Ebdo diyar kir ku di herêma Şehbayê de çêkirina tembûran karekî gelek zehmete û wiha got:"Li ser giştî herêma Şehbayê û gundewarên Şêrawa dorpêça hikumeta Şamê heye. Û di rewşeke wiha de çêkirina tembûrekê gelek zehmetî û ked dixwaze. Text û alavên taybet yên pêwîst em nikarin bi hesanî peyda bikin. Her tembûrek ku heyanî bê amede kirin herî kêm 3 mehan dem dixwaze. Di halê hazir de textên ku di nava gel de nayên bi karanîn ez kom dikin û ji wan tembûran derdixim. Dukaneke min a taybet ya kar nîne. Ez di mala xwe de di şikefteke gelek kevnar de karê çêkirina temûran dikim. Her kes matmayî dimîne, lê belê tiştekî ne xeyaliye. Em mecbûrin li gor rewşa heyî tev bigerin û ji tûnebûnê hebûnê biafrînin."



# 'Huner beşa herî girîng a jiyana mirovan e'

**Pergala mêrsalar û kevneşopiyên civakê gelek jin ji qada hunerê dûr xistine. Hunermend Mehşîd Muşehşehî dibêje: "Tevî rêgiriyê jî jin dikarin bi riya amûrên muzîkê cihê xwe di dîroka hunerê de bigrin."**

Amûrên muzîkê her yek ji wan xwedî dîrokek kevnar e. Gelê Kurd jî xwedî çend cure amûrên muzîkê yên weke dahol, erbane, saz, tembûr û hwd. e. Lê belê ji ber zordestiya aqilê mêrsalarî û kevneşopiyên berê li ser civaka Kurd, bûye sedem ku hinek amûrên muzîkê, bi taybetî ji bo mêran be. Bi taybetî dahol. Jin dikaribûn amûrên muzîkê yên weke saz, tembûrê lêbidin û çanda Kurd biparêzin.

**'Di nava civakê de xebatên hunerî ji bo jinan şerm tê dîtin'**

Mehşîd Muşehşehî ya ku amûra muzîkê tembûrê lê dixe diyar kir ku ji ber malbata wê, bi taybetî bavê wê hunermend e li tembûrê dide û ji biçûkatiyê ve bi amûrên muzîkê mezin bûye û 4 sal in li tembûrê dide, der barê rola jinan a di hunerê de wiha got: "Em jin hêza me di nasîna amûrên muzîkê yên kurdewarî de heye. Lê belê li Başûrê Kurdistanê li hemberî jinên ku bixwazin bikevin nava qada hunerê rêgirî heye."

**'Serkeftina jinan ji bo civakê dibin destkeftî'**

Mehşîd Muşehşehî da zanîn ku gelek caran dema jin di hunerê de astek bilind bi dest dixin, ji aliyê beşeke civakê û dewletên dagirker ve hewl didin asta hunerê ya jinan kêm bikin. Ji ber ku dizanin serkeftina jinan ji bo civakê dibe destkeftî û civak azad dibe. Ji ber wê jî dixwazin pêşî li azadiya civakê bigrin û wiha domand: "Tembûr û saz her dem di dîroka Kurdan de hebûne û bûne dengê azadî û xebatê. Niha jin di lêdana amûrên muzîkê de gelek baş in. Ji bo wan her du amûran hewldana parastina wê didin lê belê lêdana tembûr û erbaneyê, li Başûrê Kurdistanê ji ber kevneşopiya ku heta niha hatiye kêm e."

**'Li Başûrê Kurdistanê di hişmendiya mêrsalar de guherîn tune ye'**



Mehşîd Muşehşehî destnîşan kir ku li parçeyên din ên Kurdistanê guherînek di hişmendiya mêrsalar de tê dîtin lê belê ev guherîn hê li Başûr bi awayek berbiçav çênebûye û wiha got:"Dema ku ew jî dibînin jin hewl didin vê hişmendiyê biguherînin aciz dibin. Jin bi awayê xwezayî bi hunerê tê dinyayê ji ber hestên jinan ên xweş hene. Ez di wê baweriyê de me ku dema jin bixwazin û hewl bidin dikarin bibin hunermendên herî baş. Ji ber ku huner beşa herî girîng a jiyana mirovan e. Yek ji wan riyên ku em dikarin şoreşê bi pêş bixin, riya hunerê ye. Di civaka Kurdistanê de jinên me yên pêşeng gelek in, hewl dane çanda Kurdan bi amûrên dîrokî ber bi pêşve bibin. Ez jî hewl didim bibim pêşeng û riyeke ji bo jinên ku dixwazin werin nava qada hunerê bibînim. Hêvîdar im ew jinên ku rastî rêgiriyê tên, li hemberî wê rêgiriyê rawestin û beşdarî qada hunerê bibin."

# CÎhan Cîlo: Planên qirkirinê bi dawî nebûne û berxwedan jî berdewam e’

Bi saya berxwedana cangoriyên azadiyê yên ku ji kaniya felsefeya azad ya Rêber Apo av vexwarine, beriya 8 salan Şengal ji destê çeteyên herî xeter di cîhanê de rizgar bû. Hevseroka Rêveberiya Xweser A Demokratîk A Şengalê Cîhan Cîlo diyar kir ku tevî berdewamiya hemû hewldanên qirkirinê jî, civaka Êzidî li ber xwe dide û pergala xwe ya Xweseriya Demokratîk xurtir dike.

**Şaho Gabar /Qamişlo**



Komkujiya Şengalê ji komkujiyên herî hovane di dîroka mirovahiyê ya nûjen de ye. Li gel giraniya vê komkujiyê, ji aliyê civaka navdewletî ve îxanetek hebû, dîsa jî hêzên herêmê gelê Şengalê wek şûr firotin terora cîhanê ya DAIŞ‘ê. Roja 3‘yê Tebaxa 2014‘an de çeteyên DAIŞ‘ê dest bi êrîşên li ser gundên Şengalê kir; wekî Gurzêlê, Sîba Şêx, Rembûzî, Til Benat û Koço kirin. Gundiyan, bi taybet li Gurzêlê û Sîba Şêx li hemberî êrîşan li ber xwe da û gelek welatî şehîd bûn. Di şeva êrîşê de komek ji kesayet û rûspiyên Şengalê serî li navenda fermandarên PDK‘ê ya li herêma Şerfedîn da, da ku erka xwe bi cih bînin û êrîşan bibersivînin, lê fermandarên PDK‘ê tu bersiv nedan û hewl dan şandeyê ji vê rewşê rihet bikin. Di saetên berbanga sibehê de çeteyên DAIŞ‘ê ber bi bajêr ve pêşde ketin, çekdarên PDK‘ê ku hejmara wan bi qasî 18 hezar bûn, ber bi parêzgeha Dihokê ve reviyan, yên ku nedikarîbû bireve jî xwe spartin Yekîneyên Parastina Gel li Rojava.

### Gel di nav lepên çeteyan de ma

Gelê Şengalê û bi sedan malbatên koçber ên Mûsil û Tilefer û navçeyên ku li Şengalê diman bê çare man, tenê çiyayê Şengalê wekî rêya xilasiya ji mirinê dîtin û di bin germahiya havînê de û bi meş li ser lingan xwe spartin çiya. Di saetên destpêkê yên sibehê de çeteyên DAIŞ‘ê bajarê Şengalê dagir kir, her kesê li pêşiya xwe dîdîtin qetil dikirin, jin û zarok direvandin û pîrozgehên êzidî teqandin û şewitandin.

Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ji bo xilaskirina êzidiyên li çiyayê Şengalê korîdoreke mirovî vekir. Bi sed hezaran kes ji komkujiyan rizgar kirin û ew gihandin kamp û gundên ku Rêveberiya Xweser ji bo pêşwazîkirina wan vala kiribûn. Di vekirina vê korîdorê de 150 şervanên YPG û YPJ‘ê şehîd bûn. Li aliyekî din jî li çiyayê Şengalê Gerîlayên Azadiya Kurdistanê û kesên ji Şengalê yên dilxwaz, parastin dikirin. Di 13’ê Mijdara 2015’an de bi qehremanî û berxwedaneke mezin, bi pêşengiya gerîlayên azadiyê , YBŞ , YPG û YPJ’ê Şengal ji çeteyên DAÎŞ’ê hat rizgarkirin. Piştî wê gelê Şengalê xwe bi rêxistin kir û pergala xwe ya Xweseriya Demokratîk av kir. Lê heta niha jî planên qirkirina civaka Êzidî bênavber dewam dike, li hemberî wê jî gelê Şengala asta berxwedan û têkoşînê bilindtir dike. Derbarê salvegera 9’mîn salvegera rizgarkirina Şengalê, palnên li dijî gelê Şengalê û berxwedana gel hevseroka Rêveberiya Xweser A Demokratîk A Şengalê Cîhan Cîlo ji rojnameya me re axivî.

Cîhan Cîlo diyar kir ku armnaca êrîşên ser Şengalê qirkirina civaka Êzidê bû û wiha domand: “Çeteyên DAIŞ’ê bi pilaneke navdewletî û herêmî di 3’ê Tebaxa 2014’an de êrîşî Şengal kirin, di wan êrîşan de gelek komkujî li dijî civaka Êzidî pêk anîn. Armanca sereke ji komkujiya Şengalê jî, qirkirina civaka Êzidî bi giştî bû. Yên ku alîkariya çeteyên DAIŞ’ê di komkujiyê de kirin ji her kesî re eşkere bûn. Armanca dewleta Tirk a dagirker û PDK’ê ji destekdayîna çeteyên DAIŞ’ê, qirkirina civaka Êzidî, dagirkirina Şengalê bû. Lê bi saya berxwedana şervanên azadiyê yên ku li ser banga civaka Êzîdî berê xwe dan Şengalê, Şengal ji çeteyên DAIŞ’ê rizgar bû û planên dewleta Tirk û PDK’ê têk çûn.”

### ‘Civaka Êzidî xiyaneta PDK’ê ji bîr nake’

Cîhan da zanîn ku yên Şengal ji çeteyên DAIŞ’ê rizgar kirin YPG, YPJ û Gerîlayên Azadiya Kurdistnê bûn û wiha pê da çû: “Yên ku Şengal ji çeteyan rizgar kirin YPG, YPJ’ê û Gerîlayên Azadiyê bûn, herwiha yê ku xiyanet li Şengalê kir jî malbata Barzanî bû, ev rast ji her kesî re eşkere bûye. PDK’ê bû sedema komkujiya Şengalê û gelê Êzdî tu carî xiyaneta wê ji bîr nake, hertişt wê di dîrokê de wê bê nivîsandin.”

### ’Dewleta Tirk û PDK’ê dixwazin komkujiya Şengalê dewam bikin’

Cîhan da xuyakirin ku dewleta tirk a dagirker bi riya armancgirtina pêşeng û berpirsên Rêveberiya Xwesr A Şengalê , hewil dide ku komkujiya 3’ê Tebaxê berdewam bike û wiha got: “Rêveberiya Xweser a Şengalê bi saya keda keç û xortên Şengalê wê destkeftiyên mezintir bidest bixe û planên PDK’ê û dagirkeriya Tirk wê têk biçin. Me heval û duijminê xwe ji hev naskiriye. Armnca sereke ya avabûna Rêveberiya Xweser a Şengalê, rêvebirina Şengal ji aliyê gelê wê ve, çaresrkirina tevahiya pirsgirêkaên gel û parastina Şengalê ye, herwiha pêkanîna yekîtiya gelê Şengalê ye.”

### ‘Heta dawiyê wê berxwedan berdewam e’

Hevseroka Rêveberiya Xweser A Demokratîk A Şengalê Cîhan Cîlo axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Di dîroka 13 mojdarê şengal ji destê hovan rizgar bû û ala azadiyê li ser hat bilnidkirin, Em roja rizgarkinirna Şengalê li Rêber Apo, Gerêlayên Azadiyê, YJAStar, YPG’ê, YPJ’ê, Şehîdên ku di oxira rizgarikirina Şengalê de canê xwe feda kirin û tevahiya gelê Şengalê Pîroz dikin. Ev roj ji bo me Êzîdiyan roja vejînê ye. Di dîroka civaka Êzidî de cara yekê ye ku hêza me çêdibe û li hibemberî dijimin berxwedanî û tekoşîn tê kirin, herwiha ev cara yekê ku yekîtiya civaka Êzidê tê avakirin. Û bi bûneye roja rizgarikirina Şengalê dîsa jî em soz didin tevahiya gelê xwe ku em ê heta dawî li ber xwe bidin û planên dijim vala derxin.”

# ‘Armanc ji Pêngavê parastina civakê ye’

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Hêzên Ewkeariya Hundirîn a Bakur û Rojhlatê Sûriyê di 27’ê Cotmehê de dest bi pêngava ‘Tolhildana Şehîdên Hêzên Dijî Madeyên Hişbiriyê’ kirin. Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariyê da zanîn ku armanc ji destpêkirina vê pêngavê parastina ewlekariya civakî ye.**



Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Di 27’ê Cotmehê de dest bi pêngavya ‘Tolhildana Şehîdên Hêzên Dijî Madeyên Hişbiriyê’ kir.

Ji bo parastina ewlehiya civakê û rêgirtina li hemberî belavbûna madeyên hişbir, Hêzên Ewlekariya Hundirîn li Reqayê dest bi pêngava Tolhildana Şehîdên Hêzên Dijî Madeyên Hişbiriyê kir.

Di pêngavê de firoşkar, qaçaxçî û bikarhênerên madeyên hişbir bûn armanc û 42 kes hatin hatin girtin û qaseyek mezin ji madeyên hişbir hate desteserkirin.

Hêzên Ewlekariya Hundirîn li ser malpera xwe ya fermî amarên ku di pêngavê de hatine desteserkirin ragehand û wiha bû:

557000 hebên kaptagon, 60 kefên heşîşê, 2 çekên kilaşînkovê, 13 cercûrên kilaşînkov, 3 damanceyên 9mm, 5 narincok, 6 Cercûrên damanceyê, 10 çekên spî, Kirîstal mîs 2 kîlo û 700 kg, 261mermiyên kilaşînkovê, 53 mermiyên eyar 9 mm, 41 mermiyên BKS, amûrên bikaranîna hişbirê û 23 telefon.

Têkildarî pêngavê fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji rojnameya me re axivî.

### ‘Armanc ji pêngavê parastina ewlehiya civakê ye’

Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê da zanîn ku armanc ji destpêkirina Pêngava ‘Tolhildana Şehîdên Hêzên Dijî Madeyên Hişbiriyê’ ji bo parastina ewlehiya civakê ye û wiha domand: “Em dizanin ku li ser gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê şer bi hemû awayên xwe tê meşandin, çi şerê leşkerî be an jî yê taybet û derûnî be. Lewma me dest bi vê pêngava ewlekariyê kir. Armanca sereke ya pêngavê ew e ku civaka me jiyanek durist, bi ewle û bê madeyên hişbir derbas bike. Herwiha em tekez dikin ku wê pêngava dilsoziyê ya ku ji bo şehîdên me yên li Hemze Begê şehîd bûne hatiye destpêkirin, wê temamkirina riya ku dest pê kirine di şerê li dijî hişbirê de. Pêngav hemû herêmên me dike armanc û me di daxuyaniya ku derbarê pêngavyê belav kiribû de piştrast kir. Sedema destpêkirina wê li Reqayê ew e ku Reqa xwedî cihekî istratîcîke û ew bajarê ku hema hema di nîvê herêmên Rêveberiya Xweser de ye. Herwiha ev bajar di navbera hemû herêman de ye û me agahiya ku li ser amadekariyên operasyonên qaçaxçîtiya madeyên hişbir ên ku wê li Reqayê pêk werin û veguhestina wan bo herêmên din bi dest xistin.”

### ‘Hemû beşên Ewlekariya Hundirîn bêşdarî pêngavê bûne’

Rêveberiya Hêzên Ewlekariyê anî ser ziman ku hemû beşên Hêzên Asayîşê beşdarî pêngava Tolhildana Hêzên Dijî Madeyên Hişbiriyê yên Hemzebegê bûne û wiha doman: “Dagirkera Tirk şerekî taybet li dijî gelê me dide meşandin, bi taybet belavkirina madeyên hişbir li herêmên bakur rojhilatê Sûriyê. Tişta herî girîng ew e ku weke Hêzên Ewlekariyê li himberî vî şerî xebatê xurtir bikin. Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi hemû beşên xwe yên cuda tevlî vê pêngavê bûne , di serî de Hêzên Dijî Madeyên Hişbir, Hêzên Operasyonê û Asayîşa Jinê. Li aliyekî din jî ji bo zêdekirina hişyariya gelê me li ser metirsiyên vê nexwşiyê û encamên neyînî wê çi bin li ser aramî û ewlehiya civakê me kiliyên hevbeş bi hemû saziyên pêwendîdar ên di nava Rêveberiya Xweser de binyad kir û li gor van têkiliyên hevbeş em tev digerin. “

### ‘Armancgirtina Akademiya Hêzên Dijî Madeyên Hişbiriyê, ji bo qelskirina xebatên ewlekariyê ye’

Rêveberiya Hêzên Ewlekariyê destnîşan kir ku êrîşa ku li ser Akademiya Hêzên Dijî Madeyên Hişbiriyê ya ji aliyê dagirkeriya Tirk ve hat pêk hat, armanc jê lawazkirina xebata Asayîşê ye û wiha got: “Hedefgirtina Akademiya Têkoşîna Dijî madeyên hişbirê bi rêya balefireke şer a dewleta Tirk û şehîdxistina 29 endaman, bi taybet aramî û ewlehiya civaka me bû hedef, hedefgirtina hêzên Dijî madeyên hişbirê ji bo qelskirina xebatên ji bo tunekirina madeyên hişbir bû, lê em di Hêzan Ewlekariya Hundirîn de vîn û îradeya me zêde bû ji bo temamkirina erka xwe ya rakirina madeyên hişbir û parastina civaka xwe ji xetereyên wan e. “

### ‘Divê gel bi Pêngava Hêzên Ewlekariyê re bibin alîkar’

Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kir ku ji bo pêngava dijî madeyên hişbiriyê bi rêk û pêk bimeşe divê gel bibe destek ji Asayîşê re û wiha bi dawaî kir: “ Em hertim giringiyê didin rola milet di piştevaniya hêzên xwe de di hemû pêngav û çalakiyên ku em dikin de, û banga me ji milet re ew e ku her tiştê ku şik û gumanan li ser bikaranîna madeyên hişbir û belavkirina wê de çêdike ragihînin. Ji ber ku hevkariya di navbera hêzên me û gel de sedema sereke ya bidestxistina civakeke ewle û bê madeyên hişbir e.”



# Pêngava Azadiyê di nava mehekê de li 6 parzemînan û 31 welatî belav bû

Pêngava “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî” di nav mehekê de li 6 parzemînan de 31 welatî û 105 navendan belav bû, bi hezaran kesayetên navdar beşdar bûn.



Di 10`ê Cotmeha 2023`yan de dostên Kurdan li bajarê Strasbourgê yê Fransayê ku Konseya Ewropa, Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê (CPT) û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) lê ne, ji bo temsîla temenê Rêber Abdullah Ocalan li 74 navendan pêngava navneteweyî bi navê “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî” bi dayîna daxuyaniyên çapemeniyê ragihand.

### Ji feylozofan heta parlamenteran

Ji çar aliyên cîhanê, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlozof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û gelên xwecihî li pêngavê xwedî derketin. Wekî feylozof Slavoj Zîzek, parêzvanê mafên mirovan Atty. Melanie Gingell, ji Zanîngeha Cambridge Dr. Jeff Miley, çalakvanê mafên mirovan Atty. Margaret Oven, hevserokê Sendîkaya Unite The Union Simon Dubbins, feylesof Dr. Jason Dockstader, rêveberê Konfederasyona Sendîkayên Afrîkaya Başûr (COSATU) Motlasi Tsubani, rojnamevana Japonî Ikuko Katsumata, senatorê berê yê Partiya Keskan Lee Rhiannon, parlementera Partiya Keskan Abigail Boyd, mele Bill Crews, çalakvanê siyasî Soreti Bulbula Kadir, ji Zanîngeha Arîstoteles û Zanîngeha Makedonyayê Andreas Taksîs û hwd. tevlî pêngavê bûn.

### Şax da 105 navendan

Pêngav li 74 navendên cîhanî dest pê kir û di demek kurt de 105 navendan derbas kir. Pêngav li parzemînên Asya, Ewropa, Amerîkaya Başûr, Bakurê Amerîka, Okyanûsya û Afrîka jî belav dibe. Heta niha bi kêmanî 31 welat û bi dehan sazî beşadar bûne. Hin welatên ku beşdarî pêngavê bûne ev; Nîjerya, Bangladeş, Japonya, Fîlîpîn, Myanmar, Kenya, Afrîkaya Başûr/Swazîland, Almanya, Îngilîstan, Skoçya, Wales, Îrlanda, Fransa, Belçîka, Swîsre, Îtalya, Swêd, Danîmarka, Norwêc, Awistralya, Avusturya, Arjantîn, Spanya/Bask /Katalanya, Slovenya, Qibris, Yewnanîstan, Kolombiya, Ekvador, Rojhilatê Tîmor. Di heman demê de li çar perçeyên Kurdistanê bi hezaran sazî û kesayet beşdar bûn.

Di çarçoveya pêngavê de li bajaran, kolanan, keştiyan, pêşiya avahiyên NY û saziyên navneteweyî semîner hatin dayîn, kon hatin dayîn, meş û civîn hatin lidarxistin, pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan hatin nasandin, standan hatin vekirin, her wiha çalakiya zincîra mirovan hatin lidarxistin.

### Tevlîbûn û çalakiyên ku di mehekê de hatine lidarxistin wiha ne;

Pêngava cîhanî ya ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan û çareserkirina pirsgirêka Kurd ji aliyê Koma Civakên Kurdistanê (KCK), Komelên Jinên Kurdistan (KJK), Komelgeha Demokratîk û Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KODAR), Kongreya Civaka Demokratîk a li Ewropayê (KCKD-E), Kongra Gel, Partiya Jiyana Azad a Kurdistan (PJAK), Komela Jinên Azad ên Rojhilatê Kurdistanê (KJAR), Rêxistina Jinên Azad ên Kurdistanê (RJAK) pêngav hat pîroz kirin.

10`ê Cotmehê yek ji mezintirîn sendîkayên Brîtanyayê Unite The Union tev li pêngava ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî bû.

14`ê Cotmehê, 28 rewşenbîr, hunermend, siyasetmedar û akademîsyenên Ereb bi daxuyaniyekê tev li pêngava cîhanî bûn.

14’ê Cotmehê Înîsiyatîfa Gel a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, endamên Rêveberiya Xweser, rêveber û endamên rêxistinên sivîl, civakî, partiyên siyasî, rûspiyên eşîrên Kurd û Ereb, Kongra Star, rêxistinên jin û ciwanan, TEV-DEM û bi sedan kes beşdarî pêngavê bûn.

14`ê Cotmehê li Silêmaniyê siyasetmedar, akademisyen, rewşenbîr û çalakgerên civaka sivîl bi daxuyaniya çapemeniyê xwedî li pêngavê derketin.

16’ê Cotmehê li bajarê Chennaî yê girêdayî Hindîstanê gelek saziyên Tamîlî piştgirî da pêngavê.

19`ê Cotmehê Platforma Ol û Baweriyan a Mezopotamyayê bi daxuyaniyeke beşdarbûna xwe ji pêngavê re ragihand.

22`yê Cotmehê şêniyên wargeha penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) û Meclisa Îştar beşdarbûna xwe ji pêngavê re ragihand.

28`ê Cotmehê koma ku ji 78 kesan pêk tê, li Stenbolê deklarasyona “Banga Aştiyê” ragihand û banga rakirina tecrîdê û çareserkirina pirsgirêka Kurd kirin.

29`ê Cotmehê li Amedê 172 saziyan deklarasyonek bi navê ‘Ji niha ve ber bi dahatûyê ve banga azadiyê’ aşkera kir û got, “Roj ew roj e ku Abdullah Ocalan karibe yekser xwe bigihîne gelan.”

Li bajarê Marsîlya yê Fransayê ciwanên Kurd ji bo bal bikişînin ser tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan, di keştiyekê de çalakî li dar xist.

2`yê Mijdarê, parlamenterên Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (HEDEP) têkildarî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan daxuyaniyeke çapemeniyê da û xwest ku tecrîd tavilê bi dawî bibe.

2’yê Mijdarê Hevserokên Giştî yên Partiya Wekhevî û Demokrasiya Gelan (HEDEP) Tulay Hatîmogullari û Tuncer Bakirhan û parlamenterên wan ji bo bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtin bikin serî li Wezareta Dadê da.

2`yê Mijdarê Yekemîn Konferansa Ciwanan a Cîhanê ji aliyê 95 sazî û tevgerên ciwanan ve li Parîsê dest pê kir û 3 rojan dom. Ciwanan piştgirî da pêngavê.

8`ê Mijdarê bi munasebeta salvegera çûyîna Rêber Abdullah Ocalan a li Îtalyayê, li Parlementoya Îtalyayê bi sernavê “Li Tirkiyeyê Mafên Siyasî û Doza Abdullah Ocalan” civîna çapemeniyê hat lidarxistin. Di civînê de hate goitn, ji bo rakirina tecrîdê û mîsogerkirina azadiya fizîkî ya Rêber Abdullah Ocalan divê Îtalya erkên xwe bi cih bîne.

### Plansaziya demên pêş ya pêngavê

Li Kurdistanê û seranserî cîhanê dê meş, civîn, semîner, panel, stand û çalakiyên konvedananê berdewam bikin.

Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ), Jin ên Ciwan ên Têkoşer (TekoJIN) û tevgerên ciwanan ên enternasyonalîst wê di 11 û 12’ê Mijdarê de ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan li 13 bajarên Ewropayê bimeşin.

Li dijî tecrîda li Îmraliyê wê 18’ê Mijdarê ber bi navçeya Gemlîkê ya girêdayî Bûrsa yê ve “Meşa Azadiyê” bê lidarxistin.

Di 18`ê mehê de ji bo pêngavê û 30’yemîn salvegera qedexekirina PKK’ê ji aliye Almanya ve wê li Berlînê meşa mezin bê lidarxistin.

**ANHA**

# ‘Revandina Silêman Ehmed zilm, neheqî û binpêkirina azadiyê ye’

**Rojnamevanan diyarkirin ku revandina Rojnamevan Silêman Ehmed jî yek ji wan zilm, neheqî û binpêkirinên azadiyê ye ku di dîroka desthilata Kurdistanê de li dijî rojnamevanan hatiye kirin û wiha gotin: “Li Kurdistanê azadiya rojnamevanan dibin metirsiyê dene.”**





Edîtorê beşa Erebî ya ajansa Rojnews’ê Silêman Ehmed roja 1’ê Cotmehê ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25’ê Cotmehê dema xwest di ser deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK’ê ve hat revandin û ev 18 rojin agahî jê nayê girtin.

Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK’ê ya Dihokê bi daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast gotin ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed ‘ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye’ û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine.

Rojnamevanên Herêma Kurdistanê di derbarê revandin û windakirina Rojnamevan Silêman Ehmed ji aliyê PDK’ê ve û rewşa azadiya Rojnamevanan li Herêma Kurdistanê de ji Rojnews’ê re axivîn.

Rojnamevan Salar Mehmud di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku li Herêma Kurdistanê girtin û revandina rojnamevanan yek ji kevneşopiyên desthilatê ye û wiha got: “Çawa ku desthilat ji tevger û dengên azad ditirse, heman şêweyî ji rojnamevanan jî ditirse. Ji ber ku rojnamevanan nerazîbûnên gel radigîhin. Revandina Rojnamevan Silêman Ehmed jî yek ji wan zilm, neheqî û binpêkirinên azadiyê ye ku di dîroka desthilata Kurdistanê de li dijî rojnamevanan hatiye kirin. Li Kurdistanê azadiya rojnamevanan di metirsiyê deye. Ti deman rojnamevan ji bin metirsiyê xilas nebûne, hertim dibin gef û zextan dene. Girtina rojnamevanan astengkirina azadî, demokrasî, mafê mirovan û karê rojnamevaniyê ye.”

Rojnamevan Salar Mehmud her wiha destnîşan kir ku divê bi awayekî yasayî nêzîkatî li gel Silêman Ehmed were kirin, lê desthilat fêrî revandin û girtina rojnamevanan bûne û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Heta niha gelek rojnamevan hatine qetilkirin, ev yek jî berdewamiya nêzîkatiyên desthilatiyê di nava 32 sala de li beramberî rojnamevanan raberkirî ye.”

Rojnamevan Yasîn Nadir jî derbarê heman mijarê de axivî û wiha axivî: “Li Herêma Kurdistan yasayek taybet ji bo rojnamevanan heye. Lê desthilat bi berdewam berevajiyê yasayê karê rojnamevanan asteng dike. Rojnamevanan berevajiyê yasaya rojnamevaniyê têne girtin. Vê yekê jî em wek binpêkirina mafê ronamevanên li Kurdistanê dizanîn.”

Rojnamevan Yasîn di dewamê de bang li sendîkayên rojnamevanan û hizbên siyasî kir ku van binpêkirina rawestînin da ku rojnamevan di rewşek aram de bikarin karê rojnamevanê bikin û wiha pê de çû: “Em van gavan û girtina rojnamevanan wek binpêkirina mafên rojnamevanan û bi temamî astengkirina azadiya fikir li Kurdistanê dinirxînin.”

**Rojnews**

# Gelo Tirkiye dixwaze bi vê rêyê biçe ku derê?

**Volqan Elî**




Di destpêka Îlona vê salê de kevneşopiyeke hêzên cîhanî hate bicihanîn: Civîna 20 Dewletên pêşketî. Wekî tê zanîn ev, her sal tê lidarxistin. Hêzên serdest ên cîhanê, li hev kom dibin nîqaş dikin ku wê keda gelan çawa dagir bikin, kîjan welatan xira bikin (jixwe di mejî û hişmendiya wan de 'avakirin' tine) û kêmasiyên wan çi bûne ku nekarîne hê zêdetir civaka cîhanî tengav bikin.

Bi kurtî ev civînên nav borî, li ser vê tewerê (mînval-esas) derbas dibin. Lê ev nayê maneyê ku di navbera wan dewletan bi xwe de nakokî tine. Em dikarin vê rewşê bişibînin komek gurên dev bixwîn ku nêçîra xwe kirine û li dardora nêçîra bê ruh maye, bûne xelek. Her yek li benda zeyifiya yê din e ku ew bi xwe zêde bixwe.

Werhasilî di vê civînê de biryarek hate girtin ku di navbera Hindistan-Rojhilata Navîn-Ewrûpa de korîdoreke aboriyê (!) were çêkirin. Nav jî li vê projeya nû hate kirin: IMEC.

Îmaretên Ereb ên Yekbûyî, Erebîstana Sûdî, Yekitiya Ewrûpayê, Fransa, Îtalya, Almanya ku ev rê wê di sînorên wan re derbas bûya mohra xwe li vê peymanê dan; û ya din jî DYE'ya ku ne li ser vê reyê bû jî mohra xwe lê da.

Ev korîdor di heman demê de wê di ser Urdun, Îsraîlê re derbas be xwe bigihîne Qibrisê û li wê derê jî di ser Yewnanîstanê re li Ewrûpayê were girêdan.

Jixwe qiyamet jî bi serê Erdoxan de piştî vê daket. Bi qasî ji vê projeya mezin tê fêmkirin halê hazir Tirkiye ji derveyê vê dimîne. Ne bi tenê li derveyê proje dimîne grîngiya xwe ya stratejîk a berê wenda dike. Çi ye girîngiya stratejîk a Tirkiye?

Di dîroka qadîm de sê rêyên aborî-çandî ku Ewrûpayê li Asyayê girêdidin hene: Rêya Qiral, Rêya Hewreşîm û Rêya Baharatê. Bi navgîniya van, dewlemendiyên sererd û binerd (çanda gelan) tên veguhestin. Dewletên serdest ji ber di kontrola wan de her tişt derbas dibe, feydeya ji keda gelan bi dest dixin, ew bi xwe dixwin.

Vaye ev rêya di navbera Hîndistan û Ewrûpa de jî wê qat bi qat zêdetirî van rêyên dîrokî rol bilîze. Ji Hindîstan û welatên Rojhilata Navîn, madeyên xav biçin (petrol û hwd.) Ewrûpa, ji wê derê jî wê teknîk were.

Wekî me got, piştî ku ev hinekê eşkere bû. Agir girte Tirkiye. Di cih de ket tevgerê. Jixwe têkiliyên wê yên li cem Rûsya û Îranê hebûn. Ev nîqaş her çendî di meha îlonê de eşkere bû jî, bi qasî tê gotin di meha Tîrmehê de hin tişt diyar bûne. Jixwe dema em niha bi van daneyan difikirin hinekê mirov wate didê. Erdoxan piştî vê, dîplomasiya xwe hema bêje firand. Hakan Fidan rojekê li Îranê bû, roja din li Iraqê bû. Ev havîn û çend mehên payizê wisa derbas bûn. Dema ku em van dibêjin, ne ku agahiyeke cuda pêwîst e. Şopandina nûçeyên rojane vê encamê li pêş çavan radixe.

Projeya alternatîf a Erdoxan çi ye? Ew dibêje "bila Hîndistan dîsa hebe, lê ne Îmarat û Erebîstana Sûdî bila rê di Iraqê re derbas be û di ser Tirkiyeyê re li Ewrûpayê were girêdan". Dema em, têkiliyên dagirkeriya dewleta Tirk a sê salên dawî li cem PDK'ê û Iraqê tînin pêş çavan niyeta wê tê fêmkirin. Tirkiyê dixwaze bi vî awayî hemû cîhanê bike dijminê Tevgera Azadiyê û gerîlayên azadiya Kurdistanê. Ji ber ku dema projeyê bêbext ê Erdoxan were qebûlkirin ew welat neçar dimînin ji bo berjewendiyên xwe alîkariyeke temam bidin Tirkiyeyê. Jixwe niha Tirkiye bi çekên kîmyawî û atomî yên NATO'yê li hemberê gerîla şer dike. Eger rêya Erdoxan di Iraq û Başûr re derbas be hemû cîhan wê neçar bimîne ser rêya xwe paqij bike. Wateya vê, ji bo Kurd Û gelên din qetlîm û kom kujî ye. Vaye niha Îsraîl ser rêya xwe paqij dike; rojê bi sedan zarok û mirovên bê guneh tên kuştin. Erdoxan dixwaze bi kevirekî herî kêm nêçîra du çûkan bike: Yek; li aliyekî berjewendiyên dewletên mezin ên cîhanê dayne û li aliyê din jî gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn dayne. Yanê projeya 'Rêya Xwe' bide qebûlkirin. Dema projeya wî were qebûlkirin ev dewletên mezin ên navên wan derbasbûne, dilê wan ji bo gelê Kurd zere-î misqal naêşe. Çawa ku ji Filîstîniyan naêşe!

Du; Erdoxan xeyal dike ku bi vê projegoka xwe derdora xwe û malbata Barzanî bigihîne jiyaneke cenetî. Di vê têkoşînê de amûra herî bi hêz a Erdoxan hamaseta Hamasparêziyê ye. Ya din jî dibêje Îsraîl çima Filistîniyan dikuje? Bila nekuje, bihêlin ez Kurdan bikujim. Lê ev tenê xeyala wî ya naxweşokî ye. DYE, Almanya, Fransa û heta bi Hîndîstanê projeya xwe çêkirine û hêdî hêdî dixin meriyetê. Ji ber wê yekê DYE dibêje "Em ji bo Îsraîlê ti xetên sor danaynin". Girîngiya stratejîk a Tirkiyeyê (di rastiyê de Kurdistan) wê çendî karibe li ber vê projeyê bisekine wê dem û zeman nîşanî me bide.

# 'Divê em ji bo Abdullah Ocalan gavên xurt bavêjin'

**Parlamentoya Ewropayê ya berê û Parlamentera Qibrisê Elenî Theocharoûs piştgirî dan pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî" û got: "Divê em gavên hîn xurttir bavêjin."**



Parlamentoya Ewropayê ya berê û Parlamenterê Qibrisê Elenî Theocharoûs ku li ser têkoşîna azadiya Kurdistanê pirtûkek bi navê 'Roza' nivîsandiye, diyar kir ku sala 1980'an bi saya Teofîlos Georgîadîs ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jê re gotibû 'şehîdê me ye', gelê Kurd û tevgera azadiya Kurd nas kiriye.

**'Ji bo azadiya abdullah ocalan divê em tiştên hîn bi bandortir bikin'**

Elenî Theocharaoûs qala rojên ku bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re maye û tiştên ku Mexmûr, Rojava û kampa Bekayê jiyan kirî, kir û nerazîbûn nîşanî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan da.

Elenî Theocharaoûs wiha got: "Piştî tecrîda li ser Abdullah Ocalan, ez nizanim ka baş e yan na, ti kesê ew nedîtiye. Kî/ê dizane gelo tenduristiya wî baş e, yan na! Ew wî bi tedbîrên wiha, konferans, deklarasyon û makaleyan nikarin azad bikin. Ez bawer dikim ku divê em di asta Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê de tiştekê bikin. Piştî ku evqas sal li Îmraliyê girtî ma, tiştên ku li wî tên kirin dermirovî ne. Divê em hîn xurttir û şênbertir tev bigerin."

Elenî Theocharaoûs helwesta hêzên navneteweyî û Parlamentoya Ewropayê weke "nankorî" nirxand û wiha got: "Ji bo ku zextê li Tirkiyeyê bikin, gelek sedemên wan ên cuda hene. Ji bo xwe weke karê sereke nabînin ku ji bo azadiya Abdullah Ocalan zextê bikin. Ez ê ji seroka Komîsyona Ewropayê Ûrsûla Von Der Leyen re nameyekê bişînim û jê pirs bikim ku çima Ocalan ji hemû mafên mirovan bêpar tê hiştin. Ji ber ez difikirim ku hîna herî kêm hinek parêzvanên mafên mirovan hene."

**'Ew lîderek rast e; ez heyranê wî me'**

Elenî Theocharaoûs qala rojên ku bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re maye, kir û ev tişt got: "Bi rastî zehmet bû ku ew ji we bawer bike. Ya duyem jî, dema wî hûn qebûl dikirin û ji we bawer dikir, pir vekirî bû. Behs dikir ku ew ê çawa Kurdistaneke azad ava bike. Ew lîderek rast bû, şervanek bû. Ez heyranê wî me û bawer dikim ku girtina wî karesatek e. Beriya ku Abdullah Ocalan ji aliyê Tirkan ve were girtin, gelek caran min hevdîtin li gel kir. Ez heyranê têkoşîna wî bûm. Ez difikirim ku ew lîderekî rast e û herî kêm ji bo ku rêz ji mafên mirovan ên esas re were nîşandan, divê zext li Tirkiyeyê were kirin. Helbet êdî dem hatiye ku were berdan, bêyî darizandineke adil demek dirêj li girtîgehê derbas kir. Lê di kêliya dawî de em ji civaka navneteweyî dixwazin ku ji bo azadiya Abdullah Ocalan bila piştgiriyê bidin hewldanên me."

**'Eger em dest ji berxwedanê berdin, wê dawiya me were'**

Elenî Theocharaoûs diyar kir ku ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan du rê hene û got: "Yek rêya siyasî ye, ya din jî şer kirine. Divê em ti carî dest ji têkoşînê bernedin. Eger em dest ji berxwedanê berdin, wê dawiya me were. Ji ber ku Tirkiye ne dewletek wisa ye ku ji muzakereyê fêm bike."

**'Divê PKK'ê ji lîsteya terorê bê derxistin'**

Elenî Theocharaoûs anî ziman ku divê her kes beşdarî pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî" bibe û got: "Abdullah Ocalan xwediyê fikreke siyasî bû, lîderekî siyasî bû, xeterî didît, rîsk didît û hêza çekan bi aqilane bi kar dianî. Eger mirov hêza çek, di demek rast de, li cihekî rast û bêyî ku jiyana sivîlan bixe xeteriyê bi kar bîne, girîng e. Di vî warî de fikreke girîng jî, divê PKK'ê ji lîsteya rêxistina terorê bê derxistin. Ji bo vê yekê divê em di Yekîtiya Ewropayê de têbikoşin."



# Ciwanên Efrînê: Dîwarên Îmraliyê wê bi hêza ciwanan bê şikandin

Endamên Tevgera Ciwanên Şoreşger ya Herêma Efrînê piştgiriya xwe ji pêngava cîhanê ya azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan ragehandin û gotin, wê bi rihê ciwanên serdemê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo misoger bibe.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Bi ragehandina pêngava cîhanî ya 'Ji Ocalan re azadî û ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî' li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tavahî tevger û gelên herêmê dest bi çalakiyên piştgiriya pêngavê kirin. Tevgera Ciwanên Şoreşger yên Sûriyê weke hêzeke bingehîn ya xwedîderketina li doza azadiya fîzîkî ya Rêber Apo tê destgirtin. Li ser vê bingehê tavahî ciwanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi çalakiyên nîtalîk ji bo azxadiya fîzîkî ya Rêber Apo kirine. Ciwanên Efrîn û Şehbayê jî ji van çalakiyan ne qutin û bi awayekî aktîv çalakiyan li dar dixin.

Têkildarî piştgiriya ciwanên herêma Efrîn û Şehbayê ji pêngavê re, endamên Tevgera Ciwanan Şoreşger Rolyana Mihemed û Ebdulqadir Erûs ji rojnameya me re axivîn.

**'Faşîzma Tirkiyê wê neghêje armanca xwe'**

Rolyana Mihemed di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku bi hêza cewana wê tecrîda giran ya ku li ser Rêber Apo tê ferizkirin, bê şikandin û wiha got: "Faşîzma Tirkiyê li ser Rêber Apo tecrîdeke girankirî dide meşandin. Armanca wan ji tecrîda têkbirina destkeftiyên gelê Kurd e. Dagirkeriya Tirkiyê dema ku dibîne gelê kurd li ser asta cîhanê xwe isbat kir, tecrîdê girantir dike. Ji derveyî girankirina Tecrîda li ser Rêber Apo, tiştek di destê dagirkeriya Tirk de nema ye. Ji lewra bi girankirina tecrîdê hêz û îradeya gelê Kurd hedef digire. Tevî van polîtîkeyan hemûyan faşîzma Tirkiyê negihîştiye armanca xwe û wê tu carî jî neghêje. Bi hêza ciwanên Apoyî wê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û serkeftina doza Kurd misoger bibe."

**'Li hemberî dijmin wê hêza ciwanan li eniya pêş be'**

Rolyan destnîşan kir ku di oxira vê têkoşînê de wê ciwanên serdemê di eniya pêşîn de bin û wiha got: "Di Tevgera Azadiyê de û di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de ciwanên têkoşer her tim cebheya yekemîn ya şoreşê girtine û oxira vê dozê de bûne milîtanên azadiyê. Di şerê li hemberî faşîzmê de û di oxira vê têkoşînê de,



Rolyana Mihemed



Abdulqadir Erûş

wê her tim dijmin ciwanên serdemê me di eniya pêşîn de li hember xwe bibînin."

**Dîwarên Îmraliyê hilweşîne cenga azadiyê bi ser bixe**

Abdulqadir Erûş jî derbarê çalakiyên ciwanan yên ji bo pêngavê wiha got: "Tevgera Ciwanên Şoreşger hêza yekemîn ya şoreşê temsîl dike. Her wiha di hemû pêngav û hemleyên ji bo azadiya Rêber Apo hatine destpêkirin, ciwanan rolekî pêşeng di asta giştî de girtine ser milê xwe. Wê di vê demê de jî tavahî çalakiyên ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bên kirin bi silogana 'Dîwarên Îmraliyê hilweşîne cenga azadiyê bi ser bixe" wê bên organîzekirin."

**'Li hemberî faşîzmê bibin agirê Mazlûman'**

Abdulqadir Erûş di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku heyanî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo misoger nebe ew ê dest ji têkoşînê bernedin û got: "Misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û şikandina tecrîda li Îmraliyê armanca me ya yekemêne. Hêz û têkoşîna ku me ji îdeolojiya Rêber Apo wergirtiye û berxwedaniya ku me ji berxwedana zîndanan girtiye, wê her tim zindî bimîne û bibe riya rizgariyê. Em banga tavahî ciwanên Kurd û yên azadîxweaz dikin ku li hermberî faşîzmê bibin agirê Mazlûman û tevlî şoreşa mirovahiyê bibin."

# 'Dewleta Tirk a dagirker Tevahî zagonên navneteweyî bin pê dike'

**Avesta Menaf/Qamişlo**

**Arîfa Bekir diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker sûcên dijmirovî li dijî gelên herêmên bakur û rojhilatê Suriyê pêk tîne û got, dewleta Tirk a dagirker di êrişên yên hovane de bênesaziya herêmê dike hedef û dixweze îradeye gelên herêmê bişkîne.**



Ji despêka aloziya Sûriyê ve dewleta Tirk a dagirker ji bo kûrkirina aloziyê û dagirkirina herêmê êrişên xwe pêk tîne. Dagirkeriya Tirk ji pêkanîna planên xwe, despêkê sînor li ber çeteyên DAIŞ'ê vekir û ji tevahiya cîhanê çete derbasî Sûriyê kir, piştî têkçûna çeteyên DAIŞ`ê, dagirkeriyê bi rûyê xwe yê eşkere û bi hinceta herêmên bi ewle êrişî herêmên bakûr û rojhilatê Sûriyê kir û heta niha êrişên wê berdewamin. Di êrîşên wê yên dawî de, bi balafirên xwe yên bêmirov bênesaziya herêmên bakur û rojhilatê Suriyê dike hedef. Di êrişên dewleta Tirk ê ji 5'ê Cotmehê ve bi dijwarî li ser heremên Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê pêk hatibû, 2 jê zarok 48 kes şehîd bûn. Her wiha dewleta Tirk ji binesaziyên heremê êriş bir ser 17 jêderên petrolê, 11 stasyonên enerjiyê, 2 navendên tendirustiyê, navendeke nan, 48 dibistan, zêdeyî deh tesîsên pîşesaziyê ji kargeh û pargîdanî jî bûn hedef.

Derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û hedefgietina bênesaziyên herêmê Arîfa Endama Mecilisa Giştî ya Partiya Demokiratîk (PYD) Arîfa Bekir ji rojnemeya me re axivî.

Arîfa Bekir da zanîn ku dewleta Tirk a dagirker ji bo pêkanêna planên dagirkeriyê, êrişên xwe yên li ser herêm berdewam dike û wiha got: "Dagirkeriya Tirk êrişên xwe yên li ser Rojava û Başûrê kurdistanê dewam dike, armanca wê têkbirina Îradeya gelê Kurd e. Di êrişên ku di 5'ê Cotmehê dest pê kir, dagirkeriyê binesaziyên herêmê kir hedef. Dewleta Tirk a dagirker bi balafirên xwe rojane herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike hedef. Êrişên dagirkeriyê zirarên pir mezin gihandiye gelên herêmê, di êrîşa wê ya dawî de stasyonên elektirîkê , petrol û avê bûn hedef û nêzî 1 milyar dolar zirar gihişt binesaziya herêmê."

**'Berxedaniya gel pilanê dewleta Tirk vala derdikevin'**

Arîfa di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Tevî ku ji ber êrîşên dagirkeriyê gel di nava zehmetiyan de jiyan dike jî, lê îradeya gel xurtir bû û dest ji axa xwe bernda. Bi berxwedana gelên herêmê armanca dagirkeriya Tirk têk çû. Dewleta Tirk di hundirê xwe de gihîştiye asta têkçûnê, di aliyên siyasî, aborî û civakî de kirîzeke pir kûr jiyan dike. Ji bo ku kirîzên di hundirê xwe de veşêre, êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Gelên herêmê ji Şihbayê heya Dêrikê, hem jî saziyên ku di bin xizmeta gel de kar dikin berxwedanî û îradeyekî pir mezin dan nîşandan.Tevî ku dewleta Tirk zarokan qetil dike, mafên jinan bin pê dike û bênesziyên herêmî jî têk dibe, lê rêxisitnên mafên mirovan bêdengin."

**'Heya Rêber Apo fîzîkî azad nebe, doza gelê kurd jî çare nabe'**

Arîfa Bekir di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser sûcên dewleta Tirk ên li Efrînê, Serêkaniyê û Girê Spî û wiha pê de çû: "Armanc ji van sûcan şikandina vîna gelan e, di heman demê de şikandina moralên gel da ku teslîm bibe û gelê kurd vegerînin wekî beriya 5 hezar sal. Her wiha dixwezin pilana li ser Rêber Apo winda bikin, ev 25'sal Rêber Apo di girtîgiha Îmraliyê de birxwedaniyek bê hempa kiriye. ji ber vê yekê roj bi roj tecrîda li ser Rêber Apo zêdi dibe, ev jî bandoreke mezin li ser tevahî gelan kiriye. Doza Rêber Apo bûye dozeke cîhanî ku hemû saziyên demokiratîk piştgiriya azadiya Rêber Apo dikin. Wek pêngava vê dawîyê a bi navê însyatîfa gel ku her kes piştgiriya vê pêngavê dikin, her wiha heya ku Rêber Apo fîzîkî azad nebe, doza gelê kurd jî çare nabe."

**'Banga me li rêxistinên mafê mirovan ku dawî li dagirkeriyê bînin'**

Endama Mecilisa Giştî ya Partiya Demokiratîk (PYD) Arîfa Bekir di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Şoreşa Rojava bi şoreşa jinan tê naskirin, jinan ji bo bigihêjin vê qonaxê gelek berdêl dan û bi hezaran şehîdên jin hene, bi armanca têkbirina tecrûbeya jinan a ku li Sûriyê û Rojhilata Navîn bûye nimune, bi hemû rêbazan êrîş li wan hate kirin. Li ser vê yekê jinên pêşeng û têkoşerên azadiyê kirin armanc. Li ser vê bingihê Banga me li rêxistinên mafên mirovan ên cîhanê hene da ku destwerdanê bikin, dawî li dagirkeriyê bînin.

FENER



## Li Rojhilata Navîn Hevrikiya hişmendiyan?

**Idrîs Henan**

Rohilata Navîn bi destpêka sedsala 20`an re, bi teşeya projeya netew dewlet re, derbasî qonaxek nû dibe. Ev proje li ser bingeha parçekirin û biçûkirina parçeyên heyî dikeve meriyetê. Lew re jî, şikil û teşeya heyînên herêmê diguherin û weke oparasyoneke tubî li bedena gelên resen yên herêmê tînin. Hinek statuyên nû yên weke Îsraîlê li ser bingeha tunekirina gelê Filistînê ava dikin, û hinek statuyên fena ya Kurdan qir dikin û ji holê radikin. Stuyê gelên resen bi projeyên mêtingeriya pala xwe daye paradîgmaya nû ya netew dewlet, didin ber kêrê nijadperestiyê û gelan bi hev didin tunekirin.

Bi dawiya Şerê Cîhanê yê Duyem re, Amerîka weka cemsera hêzê ya rikbir xwe dide pêş. Ango; naveroka nakokiyan li gorî hevsengiya derketiye holê, tê hûnandin û navenda hêzê dibe DYA. Berî her kesî Îsraîl vê yekê hîs dike û ewlehiya xwe ya neteweyî bi navika DYA ve girêdide. Demek pêş de, Tirkiyeya Cimhûriyet jî dibe qeşleyekî pêşîn û bi rola Kembera Kesk ji navenda Modernîteyê re li dijî berbelavbûna sosyalîzmê li herêmê radibe. Ji ber vê jî du merheleyên paralel ên qirkirinê li Kurdistan û Filistînê bi hev re dimeşin. Angu em dikarin bibêjin ku; siyasetên tunekirin û jinavbirinê yên girêdayî cemsera nû bi awayekî pir qirêj û xwînî dest pê dikin. Îsraîl aliyê xwe ve dest bi qirkirina Filistîniyan dike û Tirkiyê jî Ermen, Kurdan, Asûr û baweriyan dikuje û asîmîle dike. Di vê navberê de bi hezaran mirov dibin mexdûrê van herdû hişmendiyan.

Dema qoçvedana li dunyaya ducemserî rû dida, tevgerên Olî, taybet yên Îslamî, weke altirnatîfa siyasî li dijî komunîzm û sosyalîzmê hatin ser dika siyaseta navneteweyî. Lew re jî avabûna Îslama siyasî, tevgerên mîna Al Qaîde, Hemas,… hwd li gorî cih û dem, cihê gumanê bûn. Lê ev tevgerên han, bi bihurîna dema hewcedariyê û meyil û projeyên wan ên stratejîk re, li ber projeyên qonaxa nû ya yekcemserî, yên weke; rêya Biharatên Hindistanê ku altirnatîfa Rêya Hevrîşmê ya Cînê ye, projeya Kendava Eqebe – Îlat – Esqelan, weke altirnatîfa Kenala Siwês a Misrê û projeya Rojhilata Navîn a Nû, skendalên cidî çêdikin. Loma jî merheleyeke nû ya dîzayînkirinê dest pê dike û şerên nû, di bin sernavên cûrbecûr de rû didin. Di heman demê de şer û koalisyonên nû li dijî tevgerên Îslama siyasî ava dibin. Ber vê jî; ji Afganîstan, heya Îraq, Sûriyê, Yemen, Afrîqya û ta Gezzaya Filistînê were şerê li dijî projeya Îslama siyasî dest pê dike. Êdî kîjan hêz û alî sûdê ji vî şerî digire? ew yek şiklê hevpeymanî û hêza projeyî diyar dike. Hemû alî, Îsraîl, Tirkiyê, Îran jî di nav de, sûdê ji vê rewşa pêkhatî digirin. Angu Hemas bi serê xwe nikara biryara êrişa 7'ê Cotmehê bide. Ne jî Îsraîl û Amerîka dikarin bibêjin ku haya saloxgeriya wan ji vê êrişê nîn bû. Raportên derketine wê yekê isbat dikin. Îro jî nakokiyên hêzan li ser bingeha herêma mak a Rojhilata Navîn ji nû ve mezin dibin û dunya bi heyama Şerê Cîhanê yê Sêyemîn re tê dozenkirin. Lê ji taybetmendiya paradîgmayên roja îro de pêşengiyê dikin, diyar dibe ku; paralelî xeta kapîtalîst, xeta demokratîk jî bi pêş ketiye û bûye xwedî statu. Loma jî, wê weke berê nebe, dê gelên heya roja îro dihatin qirkirinê li derveyî hesabên berjewendîperest, altirnatîfa xwe ya demokratîk, pêkve bijîn û rêxistinbûyîna xwe biparêzin û bi ser bixin.